

Agahdarî û rêwerzên ji bo we yên ku di karsaziyek de bûne ku lê bûyerên covid-19 hatiye dîtin

Çima ez vê agahdariyê digirim?

Bi cihê karsaziyê ve girêdayî bûyereke covid-19 ya piştrastkirî hatiye dîtin. Şopandina enfeksiyonê berdewam e û biryara derbarê berfirehiya şopandina enfeksiyonê şopînerên enfeksiyonê didin. Tu wekî têkiliyekî nêz nehatiyê teşxîskirin û weke kesekî ku rasterast bi enfeksiyonê re rû bi rû maye nayê dîtin. Di karsaziyê de her kes tête teşwîq kirin ku girîngiyek zêde bidin semptomên sivik jî. Ji her kesê ku semptomên wî hene re tê pêşniyar kirin ku xwe test bike.

Me ez niha çi bikim?

Tu dê wekî berê berdewam bikî û pêşniyarên gelemperî ku hene bişopîni, wekî mînak paqîjiya destan ya baş û li cihê ku mimkun be mesafe biparêzî. Heger semptomên te çêbin, tewra yên sivik jî, yekser biçe malê û li malê bimîne. Berî ku vegeerî karsaziyê testa covid-19 çê bike û li benda bersivê bisekine. Bala xwe bide, ger test nîşan bide ku te covid-19 tune ye, dibe ku tu paşê jî nexweş bibî.

Çawa xwe test dikim?

Tu dikarî ji 1177.se-ê xwe-testek bixwazî. Testek PCR-ê nîşan dide ka gelo di rêyên hewayê yên te de vîrusek heye an na. Test belaş e û li malê tê kirin. Wekî welî, tu bi xwe ji zarokê re test sparîş dikî. Heger zarok gihîştîye emrê 13 saliyê, hewce ye ku ew BankID an Freja eID Plus a xwe peyda bike, da ku karibe xwe-testek sparîş bike.

Ger zarok nasnameyek elektronîkî ya xwe tunebe, dikarî li navenda tenduristiyê bigerî, ku dinirxîne ka testek dikare li cem wan bê girtin. Di 1177.se de dikarî di derheqê testê de agahdariya berfireh bibînî.

BankID an Freja eID Plus peyda bike

Ji bo peydakirina BankID, erêkirina weliyek hewce ye, qaîdeyên li her bankeyek cûda ye. Sînorê temenê diguhere, lê piraniya bankan BankID didin zarokên ji 13 salî mezintir, lê ne hemî.

Nasnameya Ewlekariya Mobîl (Mobilt SäkerhetsID) û nasnameya elektronîkî ya wekî vê ji bo têketina 1177.se nayê bikar anîn.

Freja eID Plus nasnameyek elektronîkî ya belaş û mobîl (gerok) ya swêdî ye.

Tu wê wisa peyda dikî:

- Li ser mobîl an tablet-a xwe app'ek dadikêşînî.
- Serdana yek ji acentayên ATG-yê ya girêdayî vê sîstemê bike da ku e-nasnameyek di asta zêde (plusnivå) de aktîve bikî.
- Heger di biniya 18 saliyê de yî, divê tu destûrê ji weliyê xwe bigirî da ku karibî Freja eID Plus peyda bikî.

Ma heger berê min covid-19 hebû, ev dîsa jî derbas dibe?

Heger te berê, di nav şeş mehan de, enfeksiyonek covid-19 hebû, ne hewce ye ku tu testeke nû bikî. Ger tu nexweş bibî, dîsa jî heta ku tu bi tevahî sax bibî li malê bimîne..

Tecrîdkirina têkiliyên li malê kengî pêwîst dibe?

Biryara tecrîda li malê ji aliyê doktorek ve tê dayîn û tenê dema li malê nexweşek ji covid-19 yê piştrastkirî hebe tê pêk anîn.

Rastiyên li derbarê covid-19 de

Kengî dikarin nexweş bikevim?

Dema navbera girtina enfeksiyonê hetanî di dawiyê de nexweş bibî (dema înkubasyonê) di navbera 2 û 14 rojan de ye, ya herî normal 5 roj e.

Vilka symtom är vanliga vid covid-19?

Ta (agir), zekem, kuxîn, zehmetiya girtina nefesê, êşa qirikê, serêşî, êşa masûlkan, xerabûna hestên tam û bêhnê, nerehetiyên zik û zikçûn. Piraniya mirovan bi semptomên netund bi nexweşiyê sivik dikevin, lê hin kes bi nerehetiya girtina nefesê girantir nexweş dikevin û dibe ku hewcedariya wan bi lênihêrîna li nexweşxaneyê hebe.

Coronavîrûs çawa tê digere (belav dibe)?

Coronavîrûs bi rêya enfeksiyona dilop û têkiliyê tê digere. Dema ku mirovek dipişkîne, dikuxe an diaxive, dilopên enfeksiyonê li hewayê çêdibe. Heger hûn nêzikê wî kesê bin, hûn dikarin vîrûs vegirin. Dema ku dilop ketin ser rûber an tiştan, bi gelemperî bi rêya destan ev enfeksiyon ji wir belav dibe. Heger bêyî destên xwe bişon tilî têxin çav û pozê xwe, vîrûs dikarin bi vî rengî bikevin nav laş. Ji ber vê yekê girîng e ku hûn mesafeya xwe biparêzin û destên xwe timûtim bişon.